


# Nûvekirinên pêvajoyên qeydkirinê

Agahdarî ji bo malbatan

## Çi hetiye guhartin?

Guhertinên jêrîn di pêvajoyên Qeydkirina Baxçeyê Zarokan (Kindergarten) heta Sala 12 (Year 12) de hatine kirin û ji bo hemî qeydên dibistanên dewletê yên ku ji Serdema 1, 2026 dest pê dikin derbasdar in.

### Nûvekirinên di qeydkirina ne-herêmî de

Di sala 2025 de, me şert pêşkêş kirin da ku serlêdanên qeydkirina ne-herêmî ji bo xwendekarên bi hin hewcedariyên fêrbûn û tenduristiyê, xwişk û birayên xwendekarên aniha qeydkirî ne û zarokên karmendên dibistanê pêş bixin.

Di sala 2026 de, qeydkirina ne-herêmî dê her wisa ji bo:

- Xwendekarên Aborijînal û / an jî Xelkên Grava Torres Strait ji bo naskirina têkiliyên çandî, malbatî û xizmiyê kinship connections.
- Xwendekarên Kindergarten yên ku beşdarî pêşdibistaneke giştî bi dibistaneke giştî ya NSW hevbeş in bûne.

### Ji bo zarokên Endamên Parastinê bêtir nermbûn heye

Pêvajoyên qeydkirinê têne nûvekirin da ku hewcedariyên qeydkirina dibistanê ji bo zarokên Endamên Parastinê di dema veguhastinê de û dema ewlehiya xanî misoger bikin.

### Naskirina kinship (xizmên) ya kesên Aborîjînal û/an xelkên Girava Torres Strait

Dibistan dê xwedan nermbûneke mezintir bin ji bo tomarkirina xwendekarên Aborîjînal û/an xelkên Girava Torres Strait, di nav de ji bo kinship connections, ewlehiya çandî, gihîştina xwendina zimanê Aborîjînal û berpirsiyariyên çandî yên wekî Sorry Business.

### Berdewamî ji bo xwendekarên me yên herî lawaz

Rêbernameyên taybet ji bo xwendekarên li ser kefaletê û xwendekarên ku ji dibistanan derbas dibin li navendên edaletê yên ciwanan û binçavkirinê jî tête bicîh kirin û serlêdanên qeydkirina herêmî ji bo xwendekarên di vê kategoriyê de dê niha di nav 2 rojên dibistanê de werin pêvajokirin.



NSW GOVERNMENT

## Pirsên Pir Têne Pirsîn

### Ma ev guhertin ji bo zarokê min derbas dibin?

Guhertinên sala 2026 di pêvajoyên tomarkirinê de li dibistanên giştî yên NSW bi we re têkildar in:

- Aborîjînal û/an xelkên Girava Torres Strait e ku bi kinship, ziman an çandî ye
- Zarokê we li derveyî lênêrîna malê dem derbas kiriye, bi kefaletê hatiye berdan, an jî ji dibistanê derbasî navendeke edaletê ya ciwanan e an jî di girtîgehê de ye
- Yek ji dêûbavên zarokê we di Parastinê de xizmet kiriye an jî niha xizmetê dike û dibe ku bandorê li ser hewcedariyên veguhestinê bike ku ji ber karê ji bo Hêza Parastinê ya Australya.

### Dê her dibistan hewce bike ku van guhertinan bicîh bîne?

Li gorî hebûna qeydkirina dibistanê, dibistan mecbûr in ku guhertinên ji bo qeydên ne-herêmî ji bo xwendekarên ku ji bo Serdema 1, 2026 tomar dibin bicîh bikin.

Guhertinên di pêvajoyên qeydkirinê de ji bo xwendekarên ne-herêmî dê bandorê li hewcedariyên mafdariyê yên ji bo mîheng an bernameyên pispor nekin, wekî dibistanên bi tevahî bijartî, dibistanên ji bo armancên taybetî (schools for specific purposes (SSPs)), dibistanên perwerdehiya dûr, û dibistanên bi pol an bernameyên bi hewcedariyên taybetî yên mafdariyê (mînak, dersên derfetê, werzişên pispor û / an afirîner an hunerên performansê). Ev dibistan li gorî pêvajoyên xwe, pîvanên mafdariyê û nirxandinên xwe ne û dê pêvajoyên qeydkirina xwe yên heyî bişopînin.

Dibistanên yek-zayendî divê guhertinan bicîh bînin heta ku zarokê qeydkirî hewcedariya mafdariya dibistanê ji bo wî zayendî pêk bîne. Bi dibistana têkildar re têkiliyê daynin da ku bipirsin ka ev guhertin çawa têne sepandin.

### Eger zarokê min pîvanên nûvekirî pêk bîne, dê serlêdana min a ji bo qeydkirina ne-herêmî bixweber were qebûlkirin?

Ev guhertin qeydkirina zarokê we li dibistanek dewletê ya ne-herêmî garantî nakin. Dibistanên ku qeydkirina wan ne herêmî û herêmî hene dê serlêdana we binirxînin. Dibistanên ku hebûna qeydkirina ne-herêmî bi sînor in dê pêşî li qeydên ne-herêmî bidin:

- Xwendekarên ku hewcedariyên fêrbûn û tenduristiyê hene ku hewcedariyên maqûl û / an piştgiriya perwerdehiyê ya pêvek in, di nav de
  - Xwendekarên Aborîjînal û/an xelkên Girava Torres Strait bi ramanên çandî û / an malbat û kinship conections û têkiliyan
  - Seqetî
  - Temenê pêşketinê
  - Trawma
  - Fikarên parastina zarokan
  - Hewcedarî û mercên bijîşkî û kesane
- xwişk û birayên xwendekarên ku niha diçin dibistanê, bi xwişk û birayên xwendekarên di yekîneyên piştgiriyê de pêşîn têne dayîn
- xwendekarek Kindergarten ku beşdarî pêşdibistana giştî ya ku bi dibistanê re hevpar e bûye.

Ji bo agahdariyên bêtir, bi dibistana têkildar re têkiliyê daynin.

### Ma ev tê vê wateyê ku tenê xwendekarên ku ji bo qeydkirina ne-herêmî pîvanên pêşîn pêk tînin dê ji niha û pê ve werin qebûlkirin?

Na, dêûbav dikarin serlêdanê bikin da ku zarokê xwe li dibistanek giştî qeyd bikin heger zarok mafdar be ku biçe dibistanê û dibistan dikare zarokê di nav qeydkirina xwe de bicîh bike. Hemî dibistanên ku hebûna qeydkirina ne-herêmî bi sînor in, divê serlêdanên li dijî şertên qeydkirina ne-herêmî yên nûvekirî pêş bixin û binirxînin.

### Serlêdana min a qeydkirina ne-herêmî ya berê hate redkirin, lê zarokê min niha pîvanên nûvekirî pêk tîne. Gelo ez dikarim dîsa serlêdanê bikim?

Erê. Ger we di sala 2026 de serlêdan kir ku zarokê we biçe dibistanek ne-herêmî û serlêdan hate redkirin, heger zarokê we pîvanên qeydkirina ne-herêmî yên nûvekirî pêk bîne, hûn dikarin dîsa serlêdan bikin. Ji kerema xwe gavên ku di beşa jêrîn de hatine destnîşan kirin, bişopînin, "Ez çawa dikarim cihê ku min zarokê xwe qeyd kiriye biguherînim?".

### Min ji bo Veguhestina Year 6 û 7 Îfadeya daxwaziyê (Expression of Interest (EOI)) pêşkêş kir. Gelo ez dikarim cihê ku min zarokê xwe qeyd kiriye biguherînim?

Erê. Ger zarokê we pîvanên qeydkirina ne-herêmî yên nûvekirî pêk bîne, hun dikarin serlêdaneke nû bişînin dibistana ne-herêmî ya ku hun tercîh dikin, hetta heger we berê EOI ji bo veguhestina Year 6 û 7 radest kiribe. Ji kerema xwe gavên ku di beşa jêrîn de hatine destnîşan kirin, bişopînin, "Ez çawa dikarim cihê ku min zarokê xwe qeyd kiriye biguherînim?".

### Ez çawa dikarim cihê ku min zarokê xwe qeyd kiriye biguherînim?

Dêûbav an çavdêrên ku dixwazin zarokê xwe li dibistanek ne-herêmî qeyd bikin divê van gavan bişopînin da ku qeyda xwe biguherînin:

**Serlêdanên qeydkirina serhêl**

1. Herin malpera dibistana giştî ya ku hun dixwazin serlêdana qeydkirinê bikin, paşê di vebijarkên lîstê de li ser qeydkirinê (enrolment) bitikînin.
2. Li ser malpera qeydkirinê, di bin sernivîsa çawa qeyd bikin (how to enrol) li ser lînka serlêdana qeydkirinê ya serhêl (online enrolment application) bitikînin.
3. Piştî ku we serlêdana xwe ji bo qeydkirinê radest kir, dibistan dikare pêşniyarek ji we re bike ku hun hewce ne ku di nav 14 rojan de qebûl bikin.
4. Ger serlêdana we were qebûlkirin, bi dibistana ku zarokê we berê qeydkirî bû re têkilî daynin da ku ew qeydkirinê vekişînin.



NSW GOVERNMENT

**Serlêdanên forma kaxezê**

1. Bi dibistana giştî ya ne-herêmî têkiliyê daynin da ku fêr bibin ka ew dikarin zarokê we bicîh bikin.
2. Ger dibistan dikare zarokê we bicîh bike, ji kerema xwe forma serîlêdana kaxezê ya nû tijî bikin, ku dibistan dikare peyda bike.
3. Piştî ku we serlêdana xwe ji bo forma qeydkirinê radest kir, dibistan dikare pêşniyarek ji we re bike ku hun hewce ne ku di nav 14 rojan de qebûl bikin.
4. Ger serlêdana we were qebûlkirin, bi dibistana ku zarokê we berê qeydkirî bû re têkilî daynin da ku ew qeydkirinê vekişînin.

## Eger navnîşana min a daîmî an belgeyên nasnameyê yên pêwîst tune bin?

Rewş hene ku xwendekarek bêyî belgeya navnîşanê were qeyd kirin. Di nav van rewşan de, lê ne bi sînor in, zarokên Endamên Parastinê û zarok an ciwanên ku li derveyî malê ne, bi kefaletê an jî ji dibistanan di navendên edaletê yên ciwanan de derbas dibin. Ji kerema xwe ji bo bêtir agahdarî bi dibistana têkildar re têkilî daynin heke hun difikirin ku ev dikare ji bo rewşa we derbasdar be.

## Ma guhertinên siyaset û pêvajoyên qeydkirinê ya 2025 hîn jî derbasdar in?

Erê. Guhertinên ku di sala 2025 de hatine pêşkêş kirin dê ji bo qeydkirina 2026 berdewam bikin. Di nav van de hene:

- Hemî xwendekarên li ser vîzeya rûniştinê ya demkî dikarin li dibistana giştî ya herêmî qeyd bikin, li gorî navnîşana rûniştinê.
- Xwişk û birayên xwendekarên ku niha li dibistanek dewletê qeydkirî ne ji bo qeydkirina ne-herêmî têne pêşniyaz kirin, bi pêşîn ji xwişk û birayên xwendekaran re di polên piştgiriyê de li dibistanên sereke yên guncaw têne dayîn.
- Zarokên karmendên dibistanê dikarin ji bo qeydkirina ne-herêmî li dibistanek dewletê werin hesibandin.

Ji bo agahdariyên bêtir li ser van guhertinan, an jî ji bo ku hun kontrol bikin ka ew ji bo zarokê we derbasdar in, bi dibistana zarokê xwe re têkiliyê daynin.

## Ez dikarim agahdariyên bêtir li ku derê peyda bikim?

**Ji bo lêpirsînên qeydkirinê, bi dibistana ku hun tercîh dikin re biaxivin. Hûrguliyên têkiliyê yên dibistana xwe li vir bibînin:**
education.nsw.gov.au/find-a-public-school

**Ji bo agahdariyên bêtir li ser çawaniya tomarkirina li dibistaneke hukumetî ya NSW:**
education.nsw.gov.au/enrolment

**Ji bo agahdariyên bêtir li ser çawaniya qeydkirina li dibistaneke hukumetî ya NSW weke kesekî li ser Vizeya Demkî:**
https://www.deinternational.nsw.edu.au/

**Ji bo pirsên qeydkirina giştî, bi ofîsa navendî ya Wezareta Perwerdehiyê re têkiliyê daynin:**
1300 679 332

**Xizmeta Wergerandinê li ser Telîfon**

Eger pêdiviya we bi wergêrekî hebe ku ji we re bibe alîkar ku hun bi dibistanekê an jî Wezareta Perwerdehiyê re têkilî daynin, ji kerema xwe li Xizmeta Wergêrê Telîfonê li 13 14 50 bigerin û wergêr bi zimanê xwe bixwazin. Hejmara têlîfonê ya ku hun dixwazin lê bigerin ji opêrator re bibêjin û opêrator dê wergêrekî li ser xetê bigire da ku di axaftinê de alîkariya we bike. Ev xizmet belaş e.